Şopdara Rastiyê ye
# Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar :1287   6-Tîrmeh-2025   www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/   rojnameyaronahi   @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com   Rojnameya Ronahî   +963 984 370 218

# 'Huner zimanê giyanê mirov e'

Hêvî Keleş/ Qamişlo

**Şêwekara Kurd Zozan Betal anî ziman ku ew bi riya tabloyên xwe hewil dide ku êşên jiyan, evîn û mîrateya Kurdî bide xuyakirin û wiha got: "Huner bû zimanê giyanê min."**



Dema ku kaxez diaxive, hunermend û şêwekara Kurd Zozan Betal pencereyek nenas li ser cîhana orîgami vedike, bi cil û bergên Kurdistanê lêdike û dihêle ku ew bi Kurdî biaxive, aliyek nû dide wê. Ew bedewiya dîtbarî bi sembolîzma jîngeh û mîtolojîk re tevlîhev dike, kaxezê vediguherîne qadeke azad ji bo îfadekirina pirsgirêk û wateyên hemdem ên ku di çanda Kurdî de kûr in. Zozan têkiliya di navbera kaxez û nasnameyê, di navbera huner û jîngehê de, bi riya hunera Orîgamî ya Japonî ku bi destên xwe bi Kurdî da nasîn.

Orîgami, an jî qatkirina kaxezê, hunereke kevnar a Japonî ye ku li ser teknîkên geometrîk xwe dispêre da ku kaxezê bêyî birîn an zeliqandinê veguherîne şeklên sê-alî. Lê belê, ev huner, tevî sadehiya amûrên xwe, gelek rastbûn, xeyal û destdana hunerî hewce dike. Ev ew tişt e ku Zozan Betal bi awayekî bêhempa karîbû biguhezîne da ku ne tenê li Rojava bibe hunermenda yekem, belê, ew di asta hemû Kurdistanê de ye ku bikeve vê qada cîhanî û taybetmendiyek herêmî û Kurdî ya berbiçav bide wê.

**Kurte jiyana Zozan Betal**

Zozan Betal li bajarê Hesekê ji dayîk bûye, ji peymangeha Amadekirina Mamosteyan derçûye, herwiha ew di 2003"yan de bûye mamosteya matematîkê û weke rahêner li ser entegrekirina teknolojiyê di perwerdeyê de xebitiye. Di sala 2016"an de bi malbata xwe re çûye Başûr û li wir bi cih bûye û di sala 2023"yan de vegeriyaye bajrê Qamişlo. Ew hevjîna nivîskar û hunermendê dîtbarî Ammar Musa ye. Wê li Rojava û Başûrê Kurdistanê pêşangehên takekesî li dar xistiye û beşdarî gelek pêşangehên komî û malbatî bûye.

Derbarê şêwekariyê de şêwekara Kurd Zozan Betal ji Rojnameya me re axivî.

**'Di tabloyên min de kaxez diaxive'**

Şêwekara Kurd Zozan Betal destnîşan kir ku hunera ku ew bi kar tînin ji hunerên din cuda ye ku ew bi kaxezan tabloyên xwe çêdike û wiha got: "Ez kaxezekî ku ji



bo nivîsandinê tê bikar anîn di tabloyan de bikartînim û min kaxez da axaftin. Di Tabloyên xwe de bêhtir bale dikşînim ser êşên di jiyanê de û zehmetî, bandora evîniyê di jiyana me de dikşînim, herwiha nameya xwe ya di jiyanê de pêşkêş dikim û fiklora kurdî jî di wan de tê xuyanîkirin. Hunera Orîgamî hunerek balkêş bû ji bo min ku çawa dihêle ku kaxez biaxive, dema ku min cara yekem ev huner dît bala min kişand ku çawa bi kaxezan tabloyan çêdikin û tabloyin bi wate. Ev jî hişt ku ez jî dest bi vê hunerê bikim û xwe tê de li pêş bixînim. Bandora hevjînê min li min hebû ji ber ew jî şêwekar e, wî jî gelekî piştgiriya min kir û bû alîkar bi min re ku ez vê hunerê li pêş bixînim. Em her dû alîkariya hev dikin û fikreyan didin hev ji ber karê em dikin nêzî hevin. Malbata min piştgiriya min kirin, herwiha dema ku min bi hunera Orîgamî destpêkir, min dît ku çawa gelek Kesan ji awayê hunera min hezkirin, vê bêhtir hişt ku ez xwe li pêş bixînim.

**'Min îlhama xwe ji filiklor û mîrata kurdî girt'**

Zozan Betal axftina xwe wiha qedand û got: "Di tabloyên xwe de êş, evînî, dîrok û mîrata kurdî ez tînim ber çavan û hewil didim di tabloyên xwe de van tiştan bidim xuyakirin. Karên min ji milekî ve hêsan xuya dike, lê di heman demê de heyanî astekî zehmetiyên xwe hene. Ya ku herî zêde bala min dikişîne pirsgirêkên mirovî ne, bi êş û neheqiya ku tê de ye. Ez di wê baweriyê de me ku huner xwedî hêzek awarte û bandorek a kûr e, Min îlhama xwe ji filiklor û mîrata kurdî girt ku xalîçeyên pirreng û cil û bergên kurdî di tabloyên xwe de didim xuyakirin. Ez bi gelek pêşangehan rabûme pêşangehek li bajarê Hesekê, du pêşangeh bi hevjînê xwe re li bajarê Qamişlo, du pêşengeh li Duhokê û cara dawiyê jî pêşangehek bi tenê li Qamişlo, cihekê van pêşangehan yê taybet di jiyana min de heye. Di demên pêş de ez ê hewil bidin ku bi gelek pêşangehan rabim.

## Gotina Dawî



### Kurd li Şamê tên girtin

Mihemed Seydi

Piştî rêjîma Şamê ji hev belav bû û ya Colanî xwe bi cih kir, dihat texmînkirin ku hinekî zextên li ser Kurdan kêmtir bibin û êdî kêmekî be jî ew serbest dikaribin di nava vî welatî de biçin û bên.

Ji ber têkoşîna xelkê Sûriyê ku bi guhertina rêjîmê bi encam bû, li ser hêviyeke aştiyê bû. Lê niha çi diqewime?

Beriya demekê li Şamê çend Kurd hatin girtin ku di nav wan de rojnamevan jî hebûn û piştî destwerdana aliyên Kurd bi çend rojan hatin berdan. Hat gotin ku ew bûyer bê plan derketiye holê û weke normal be hat ziman. Paşê, hêdî dêdî nûçe û agahî belav bûn ku Kurd an li ser bendên kontrolê yên hikumeta veguhêz yan jî li nava kolanên bajarên weke Şam an jî Helebê, rastî tûndiya endamên vê desthilatê hatine. Her çi be jî, çi bûyerên wiha pêk hatin, hat gotin ku ew takakesî ne û ew temsîla siyaseta Şamê nake.

Di heman demê de Kurdên hatibûn girtin, piştî aliyên nava Rêveberiya Xweser destwerdan dikirin dihatin berdan. Herî dawî Rojnameger Hesen Zaza ku bi xwe ji Kurdên Şamê ye û temen mezine, hate girtin.

Hesen Zaza bi xwe jî salaye ji ber desthilata Şamê berê xwe dabû Rojava û Kurê wî jî di bin êşkenceyê de, bi destê rêjîma Baas hatibû kuştin. Zaza ji xwe beriya wê jî li gorî hin agahiyan, destûra fermî ya vekirina navendeke çandî ya Kurdî girtibû ku wê serokatiya wê bike. Lê ew hat girtin ji ber ku Kurd e.

Hîne mijara girtina Rojnamegeran di rojevê de bû, hinek welatparêzên Kurd hatin girtin ku heta nivîsandina vê gotarê jî agahî li ser wan nehatibûn bidestxistin. Derbarê van girtinan de Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê daxuyaniyek da û bang kir ku divê ev bûyerên girtinan werin zelalkirin û çarenivîsa van welatparêzan eşkere bibe. Piştî vê daxuyaniyê bi du rojan, hat diyarkirin ku hin Kurdên ji Kobanê ku ji bo karê xwe yê takekesî çûne Şamê jî hatine girtin. Malbatên wan ne dizanîn zarokên wan li ku ne û ne jî dikarîn xwe bighînin wan. Tirsa wan ku ew di nava vê tevlîheviya desthilata Li Şamê de werin kuştin an jî tiştek bi wan bê.

Lewma êdî di nava Kurdan de tirsa çêdibe ku werin girtin ger berê xwe bidin Şam an jî Helebê ku bajarên mezin ên Sûriyê ne. Gelek Kurd jî berê xwe didin van bajaran, ji ber sedemên tenduristiyê, ji ber nexweşxane û bijîşkên bi nav û deng û xwedî derfetên zanistî û teknîkî li van deveran nin.

Derbarê vê mijarê de gotina dawî ew e, an wê Rêveberiya Xweser di asteke bilind de destwerdan bike da mijar bibe rojev û pêşî li van girtinan were girtin, an jî ew ê hêdî hêdî yên li Şamê desthilatin ji xwe re destdirêjiya li Kudan eşkere bikin siyaset û pêşî li çûna Kurdan li nava bajarên Sûriyê yên weke Heleb û Şamê bigrin.

### Sudoku:Pirs 47

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | | | | 4 | | | 7 | |
| | | | | | | | 3 | |
| 4 | 5 | | 6 | | | 1 | | 9 |
| | 8 | 7 | 1 | | 6 | | | 4 |
| | | 1 | | | | 8 | | |
| 6 | | | 7 | | 8 | 5 | 2 | |
| 8 | | 2 | | | 9 | | 5 | 3 |
| | 4 | | | | | | | |
| | 7 | | | 8 | | | | 6 |

### Sudoku: Bersiv 46

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 5 | 9 | 6 | 2 | 4 | 3 | 8 | 1 | 7 |
| 1 | 3 | 2 | 8 | 7 | 9 | 4 | 6 | 5 |
| 8 | 4 | 7 | 5 | 1 | 6 | 9 | 2 | 3 |
| 3 | 5 | 1 | 4 | 6 | 7 | 2 | 9 | 8 |
| 2 | 8 | 4 | 1 | 9 | 5 | 3 | 7 | 6 |
| 7 | 6 | 9 | 3 | 2 | 8 | 5 | 4 | 1 |
| 9 | 7 | 8 | 6 | 5 | 4 | 1 | 3 | 2 |
| 4 | 2 | 5 | 7 | 3 | 1 | 6 | 8 | 9 |
| 6 | 1 | 3 | 9 | 8 | 2 | 7 | 5 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Rûnê genî li ser nanê xwedî:**
- Malê xirab li xwediyê xwe vedigere.

**Rûyê xwe tenî kir/eniya xwe tenî kir/ tenî li eniya xwe kir:**
- Karekî pir xirab kir.

**Seriyek pîvaz bînê berdide beroşekê:**
- Yekê xirab navê malbatekê pîs dike.

**Sîran dixwe û li zirneyê dixe:**
- Gotinên nebaş dibêje; tiştên pîs dike û li derdora xwe belav dike.

**Tilya xwe li avê dixe avê şêlo dike:**
- Karekî baş nake; tiliya xwe dixe nava çi tiştî xirab dike.

**Tiştên şêx û mela dikin dîsa rehmet li me cahilan:**
- Mezin ji piçûkan tiştên xirabtir dikin.

**Tu ji seyan re çaroxan bidirû wê çaroxên xwe bixwin:**
- Bi kêrî qenciyê nayê, mirovekî beredayî ye.

**Weke dêlika tu toleyên wê ji ber bigirî:**
- Har bûye; êrîş dike.

**Xezeb ji rûyê wî dibare:**
- Dema yek qenciyê bi yekî bike û bi xirabî lê vegere hingê tê gotin.

**Yekî nav li navan tinebû diçû dirît ser ferşê kehniyê:**
- Ji bo ku jê bê behskirin tiştên xirab dike.

**Yê sîran bixwe bîna gulan jê nayê:**
- Kesê neqenciyê bike, ti kes bi başî behsê nake.

**Zina ji rûyê wî dibare:**
- Pir xirab e.

**LI SER MAFDARIYA NEZANÎNÊ**

**Ma ez ji tiliya xwe bibêhn im?**
- Ma minê çawa bizaniya?
(Dema yek ji yekî dipirse, dibêje; te çima filan tişt nekir, (yan nedît) hingê dibêje)

**Ma ez tiliya xwe bêhn dikim:**
- Bi heman wateyê.

**Ma min destê xwe bêhn kiriye:**
- Bi heman wateyê.

**Ku bizanim ka ezê kengê bimirim, ezê ava xwe germ bikim û kefenê xwe bibirim:**
- Ma ezê ji bûyerên pişt re biqewimin, çawa agahdar bibim.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Rêber Apo ji bo ciwanan bûye koka jîn û jiyanê'



Ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku ew dixwazin nêrînên xwe bi Rêber Apo re parve bikin, bi wî re nîqaş bikin û gotin, "Em ê Kampaniya "Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim" li tevahî cîhanê belav bikin."**R-3**

## 'Me hezkirina welat û jiyana azad di dilê zarokên xwe de çand'

Welatparêza Kurd Leyla Gulo diyar kir ku tevlîbûna jinan a di nava Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de ji cîhanê re bû mînak, lewra îdeolojiya jinan bi çalakiyên leşkerî û siyasî re têkel dibe. Wê destnîşan kir ku îdeolojiya ku partiyê pêşxistiye wê di nava jinên Kurd de bimîne û di dilê zarokên wan de jî bi cih bibe.**R-2**



Şopdara Rastiyê ye
# Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar : 1287   6-Tîrmeh-2025   www.ronahi.net/ku/   Nirx: 500 L.S



## Ji çiraxên hunera Kurdî

Hunermend Şevger Mîrza, yek ji wan dengên herî berbiçav tê hesibandin ku beşdarî parastina nasnameya çandî, vejîna mîrasa stranbêjî, berevaniya ziman û nasnameya neteweyî ya Kurdî bûye.**R-7**



## Di vîna xwe de bi israr in...

Dîrok çerxek zêrîn e, pêwîst e em li gorî rûpelên dîrokê bijîn. Divê em ji bîr nekin tişta ku em îro dijîn û dinivîsin, dîroka me ya pêşerojê diyar dike. Taybet wek ciwanê Kurd em hertim gazincan ji pêşiyên xwe dikin ku bo çima pêşerojek ronî ji bo me dabîn nekirine û çima dîroka me ya hatiye jiyîn nehatiye nivîsandin...**R-6**

# RÊBER APO: QIRKIRINA ÇANDÎ YA KURDAN DEWAM DIKE

Çanda Kurd bi tevahî hêmanên xwe yên madî û manewî ji sedî sed hatiye înkarkirin û qedexekirin, bi pêkanînên asîmîlasyonê yên bê sînor, xwestine qirkirina çandî temam bikin. Modernîteya kapîtalîst, çawa ku di qada çanda madî de kiriye, di qada çanda manewî de jî helwesteke asîmîlasyonîst û qirker nîşan daye û ev jî bi mekanîzmayên tinekirinê yên dewleta netewe pêk aniye.**R-5**






## 'Rêber Apo hezkirina welat di dilê me de ava kir û em bûn aşiqê azadiyê'

Kesên ku di demên berê de bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re civiyan, xwe bi wan civînan bi serbilindî nîşan didin û radighînin ku ew civîn ji bo wan pir bi nirx û hezkirina ji dil ya welatparêziyê di giyanê wan de çand. Lewra ew azadiya Rêber Abdullah Ocalan çareserkirina hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn, dibînin.**R-4**



**Yan Berxwedan Belav Bibe yan Bêdengî Mezin Bibe**
Sînan Cûdî R-4



**Geşbînî Bi Qasî Helwest û Seknê Ye**
Idrîs Henan R-5



**Şêx Seîd II**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6



**Aqlê nû yê vê demê**
Remezan Olçen R-7

# ‘Me hezkirina welat û jiyana azad di dilê zarokên xwe de çand’

Welatparêza Kurd Leyla Gulo diyar kir ku tevlîbûna jinan a di nava Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) de ji cîhanê re bû mînak, lewra îdeolojiya jinan bi çalakiyên leşkerî û siyasî re têkel dibe. Wê destnîşan kir ku îdeolojiya ku partiyê pêşxistiye wê di nava jinên Kurd de bimîne û di dilê zarokên wan de jî bi cih bibe.

**Dilîn Ehmed/Qamişlo**

Ji bo rizgarkirina xaka Kurdistanê û mafdayîna gelê wê, ji dîrokê ve bi dehan serhildan û tevger li hember dijminê gelê Kurd şer kiriye. Piştî avabûna Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) êdî doza gelê Kurd li cîhanê bi nav û deng bû bi taybetî piştî Şoreşa Rojava bû mijara sereke li her çar perçeyê Kurdistanê û tevahiya cîhanê. Cudahiya vê partiyê ji partî û rêxistinên din, tevlîbûna jinan û rola wê ya sereke di nava tevgerê de. Tevlîbûna jinan di tevgerê de hişt ku rola jinê di civakê de bê guhertin wan ji mejiyê baviksalarî rizgar bike û di civakê de bive xwedî roleke girîng û pêşeng.

Partiya Karkerên Kurdistan (PKK) di sala 1978’an de bi serokatiya Rêber Apo hat damezrandin. Jin ji salên 1980’î û vir ve tevlî refên wî bûne, di salên 1990’î de tevlîbûna wan zêdetir bû. Jixwe armanca partiyê ji tevlîbûna jinan ew e ku, jin ne parçeyek pergala kapîtalîst were dîtin, tevger dixwaze nêrîna civakê ya li ser jinan ku tenê weke amûrekê di malê de, ji holê rake. Di salên 1980’î de di nava refên PKK’ê de rêxistina jinên Kurd dest pê kir û di sala 1987’an de yekemîn rêxistina jinan bi navê “Yekîtiya Jinên Welatparêzên Kurdistanê (YJWK)” hat avakirin û di serî de li Ewropayê çalak bû. Her çend di destpêkê zehmetî hebû jî, lê ji bo bilindkirina hişmendiya jinan di derbarê mijarên rizgarî û nasnameya neteweyî de, jinan biryara serketinê ya jinan da bûn.

Tevlîbûna jinan a di nava partiyê de, weke ku me berê behs kiribû, tenê bi karên alî û lojîstîkî ve sînordar nema. Bi awayekî aktîf beşdarî operasyonên şer bûn, di pêşengtiya girîng de cih girtin û yekîneyên jinan ên serbixwe ava kirin, weke “Yekîneyên Jinên Azad” (YJA-Star) ku nûnertiya hêza leşkerî ya jinan a partiyê dike.

### `Li her çar parçeyên Kurdistanê jin şoreşa xwe bi rê ve dibe`

Welatparêza Layla Gulo ku di malbateke naskirî bi girêdana xwe ya netewî û siyasî ji doza Kurd re mezin bûye, Leyla ku dayîka du şehîda ye ji Rojameya me re



axivî û diyar kir ku: “Di destpêka damezrandina partiyê de rola jin zêde ne diyarker bû, lê bi herikîn û mezinbûna ramanên Rêber Apo re rola herî pêşeng a jinê ye . Xwe pêş xist, yekitiya xwe ava kir û şoreşa xwe li her çar parçeyên Kurdistanê bi rê ve birin. Her wiha jinên ku li ser felsefeya partiyê mezin bûne bi disîplîn û karînên xwe yên Rêbertiyê hatin naskirin. Di heman demê de jin di rêveberiya navendî û meclîsên rêxistinî yên partiyê de cih digirin û di pêşxistina stratejiyên siyasî û ragihandinê de jî xwedî roleke girîng in.”

Di berdewamiya axaftina xwe de Leyla wiha got: “Di qonaxên destpêkê de di derbarê rola jinê ya di têkoşîna siyasî û civakî de nêrîn pêş xistin û feraseteke ku azadiya jinê weke azadiya civakê pênase kir, pejirandin. Rêber Apo yekemîn kese ku Konfederalîzma Demokratîk û azadiya jin di cîhanê de pêş xist, bi vê re jin weke stûna avakirina zanista jin a azad û demokratîk tê dîtin.”

### `Em ne aşiqê kuştinê ne lê welatê me hêjeye can fedahiyê ye`

Leyla Gulo teqez kir ku gelek jin bi saya fikir û felsefeya partiyê bi hezara jin ji bindestiyê azad bûne û ji bo bidestxistina mafê xwe yê jiyanê wê her li ber xwe bidin û wiha dirêjî da axaftina xwe: “Ji bo parastina dîroka gelê Kurd û bidestxistina mafê gel bi taybetî mafê jinê û girîngiya rola wê di civakê de, bi deh hezaran keç û xurtên me canê xwe feda kirin. Em ne miletekî hezkirê şer û kuştinê ne, lê ji bo azadkirina xaka me ya pîroz, çi ji me bê xwestin emê her tim amade bin. Lewra em weke gelê xwecihî li ser vê xakê daxwaza mafên xwe dikin. Doza me û partiya me yek e. Partî 52 sal in ji bo doza gelê xwe têkoşîn kiriye.”

### `Bi saya felsefeya Tevgera Azadiyê dîrok û çanda me hat parastin`

Her wiha Leyla bal kişand ser encamên Konferansa 12.an ya partiyê û got: “Doza gelê Kurd di nava dilê her welatparêzekî ku ji gelê xwe hez dike de ye. Têkoşîna me ya ji bo mafên xwe ranawest e. Biryara seknandina şerê çekdarî nayê wateya dûrxistina ji dozê, na. Berovajî wê êdî ji niha û pêde wê têkoşîna lihvkirina siyasî were destpêkirin. Bê goman baweriya me bi partiya me xurt e, lewra bi saya felsefeya partiyê û xwîna şehîdan me xwe naskir û me çand û dîroka gelê Kurd ji cîhanê re jî diyar kir.”

Leyla Gulo di dawiya axaftina xwe de wiha got: “Em niha di qonaxeke pir hestiyar de derbas dibin, ji bo wê hêvî dikin ku biryarên siyasî yên di vê serdemê de werin girtin, di berjewendiya gelê Kurd de bin. Her wiha heta ku em negihêjin mafên xwe, negihêjin vîna şehîdên xwe û azadiyê fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan, em ê têkoşîna xwe bi taybet têkoşîna jinan ranewestîn in.”

# Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê qada sporê bi rengê jinê geş dibe

**Esma Mistefa/Qamişlo**

**Hevseroka Yekîtiya Werzîşê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Menar Necar da zanîn ku armanca wan guhartina zihniyeta ku spor tenê bi yek zayendê tê naskirin û sepandine û got, “Em çiqas piştgiriya jinên ciwan bikin, wê ewqas rengê jinê di sporê de diyarker bibe”.**

Bi mezinbûna Şoreşa Rojava re jinên ciwan di qada sporê de cih girtin û rûxmî hemû astengî û bendên civakî karîn xwe tê de îsbat bikin. Têkildarî xebata jinên ciwan di qada sporê de Hevseroka Yekîtiya Werzîşê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Menar Necar bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.

**Di qada sporê de jinên ciwan çiqas xwe birêxistin kirine û ji bo avakirina civakeke bi tendurist û wekhev rolekekî çawa girtine ser xwe?**

Jinên ciwan rûxmî hemû bend û kevneşopiyên civakê, karîn cihê xwe bi xurtî di qada sporê de bigrin û xwe birêxistin bikin. Helbet di nava civakê de qalipên hişmendî yên tund hene û heyanî niha jî li hin deveran ev zihniyet derdikeve pêş. Xebatê sporê karî heyanî astekê vê zihniyetê derbas bike û jinên ciwan vekşîne qada sporê. Çawa ku ciwan cihê xwe di hemû beşên sporê de digrin niha ew derfet heye ku jinên ciwan li gorî daxwaz û hezkirinên xwe cihê xwe di beşa ku dixwazin de bigrin. Bi giştî jinên ciwan di asteke bilind de li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xwe birêxistin kirine û qada sporê bi rengê jin tê xemilandin.

Di aliyê rêxistinî de em ne tenê aliyê pratîkî re mijûl dibin, her wiha di aliyê îdeolojîk û perwerdeyê de sporvanên jin cihê xwe digrin, da ku em li ser bingeheke birêxistinî, exlaqî, tendurist û îdeolojîk xebatekî werzîşê li ser asta herêmê birêve bibin. Her wiha jinên ciwan di her herêmekê de çalakiyên sporê lidar dixin û bi awayekî rojane perwerdeyên meslekî tên birêvebirin.


**Xebatên we yên ji bi pêşxistina spora jin bi çi armancê tê pewerde kirin, çiqas jin cihê xwe tê de digrin, tîmên xweser çiqas in û çi ne, her wiha li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê we çi xebat daye meşandin?**

Armanca me li ser bingeha avakirina civakeke ku tê de jin bikaribe di hemû beşên jiyanê de cih bigre û bi nêrîn û daxwaza xwe li cihê ku xwe tê de dibîne kar bike û xwe pêş bixe ye. Ya din guhartina hişmendiya ku spor tenê bi yek cinsê tê sepandin û naskirin. Di vî warî de her çiqas piştgiriya jinên ciwan di aliyê sporê de bê kirin wê ewqas bandora xwe di civakê de jî biteyse. Li ser asta her herêmekê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê hema bêje hemû tîmên lîstikan yên weke basketball, football, volleybal û goka destan yên xweser hatine avakirin. Her wiha lîstikên tekane yên weke şatranc, keretê, taykwando û lîstikên hêzê hene. Di aliyê hejmar de em nikarin zelal bikin ji ber her tim di nava zêdebûnê de ye. Yek ji gavên berbiçav yên pêşketinê di qada spora jin de, ew jî avakirina kadroyên sporî ku perwerde dikin û hekemên jin hatine avakirin.

Di demên dawiyê de maçên footballê yên jin li bajarê Kobanê û Qamişlo hatin orgenîzekirin. Her wiha leyîstikên din yên weke keretê û lîstikên hêzê jî hatin birêxistinkirin. Ev çalakî li ser asta herêman û ya giştî ji demekê heyanî demekê tên birêxistinkirin. Her wiha di nava civakê de jî bi awayekî erênî tên pêşwazîkirin.

**Astengî û bendên ku li pêşiya spora jin çi ne, her wiha ji bo pêşketina vê qadê hewildan û projeyên we çi ne?**

Helbet ji bo avakirina sporeke taybet bi ya jin di nava civakê de, wê gelek astengî derkevin holê. Spora jin rastî gelek astangî û



zehmetiyan hat. Ya sereke ji aliyê civak û hişmendiya kevneşopiyên civakê ve rastî zehmetiyan tê. Ya din jî di aliyê destekdayîna madî û manewî de divê hê zêdetir ev qad bê piştevanîkirin. Ji ber kesên nîtalîk û bi hêz hene ku em dikarin bi wan re bibin alîkar û spora jin di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de li ser asta cîhanê bi navûdeng bikin. Her wiha em bixwazin nexwazin li gorî rewşa siyasî û leşkerî ya ku herêm jiyan dike li ser sporê jî bandor dike. Projeyên li pêşiya me berfirehkirina binesaziya sporî ya jin, bi taybet piştgiriya sopra di dibistan, peymangeh û zanîngehan de. Di heman demê de yek ji projeyên me yên vê salê vekirina dewreyên perwerdê yên ji bo rêvebirin, perwerdekar û hekemên jin bêne avakirin.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Şevger Mîrza Stûnek hunerî ya bilind û çemek ji awazan û helbesteke ku dilan av dide. Di sîbera pirsgirêkên dîrokî de yên ku gelê Kurd rû bi rû pêre dimîne, ji koçberkirina bi zorê û bêparbûna mafên zimanî û çandî, hunera Kurdî - nemaze stranbêjî - yek ji amûrên herî berbiçav ên berxwedana çandî avakir. Hunermend û stranbêjên Kurd di parastina zimanê kurdî, belgekirina mîrate û avakirina nasnameyek çandî û neteweyî bi giştî di rûyê polîtîkayên çewisandin û piştguhkirinê de, rolek girîng lîstin, strana kurdî ne tenê rengek ji rengên vegotinek bedewiyê bû, lê ew amûrek siyasî û perwerdehiyê bû, ku di parastina avahiya çandî ya Kurdî û pêşîgirtina li ser tunekirina wê roleke girîng lehîst.

Hunermend Şevger Mîrza, yek ji wan dengên herî berbiçav tête hesibandin, ku beşdarî parastina nasnameya çandî, vejîna mîrasa stranbêjî û berevaniya ziman û nasnameya neteweyî ya kurdî bûye. Hunermend, awazdêner û Muzîkjen Şevger di sala 1962’an de ji dê û bavekê kurd (Mihemedê Sor - Şemsa) li bajarê Dêrikê hate dunya yê, ew ji herêmek e ku di dewlemendiya xwe ya çandî û cihêrengiya xwe ya neteweyî tête zanîn û ew dayindek bû ji bo gelek dengbêjên Kurdî ên ku hewildidan ku parastina nasnameya gelê kurd û mîrateya wê ya stranbêjî ya dewlemend bikin. Ew di nav malbatek neteweyî ya Kurdperwer, ku ji huner, stranbêjiyê û folklora kurdî hez dikir mezin bûye.

Meylên wî yên hunerî, evîna wî ji bo stranbêjiyê û eşqa wî ya ji bo muzîka kurdî di temenek piçûk de dest pê kiriye, dema ku ew hîn deh salî bû, di bin bandora jîngeha dewlemend ya mîrateya mûzika kurdî li herêma Dêrikê, ji zaroktiya xwe ve, wî guhdarî dengê radyoyên Kurdî yên Bexdayê û Yerîvanê dikir, hişte ku hunera wî ya muzîkî ava bibe û ew ji stranên stranbêjên kurdan yên mîna:(Mihemed Arif Cezrawî, Isa Berwarî, Seîd Axayê Cizîrî, Tehsîn Taha û Bişar Zaxoyî) bi bandor bû, herwiha wî ji stranên hunermendên kurd yên li herêma Dêrikê yên mîna ( Ebdul Ezîzê Simê Reşîd Elanê, Ibrahim Bane Qesrî, Ebdo Elanê...) jêhatîbûna xwe ya hunerî û çandî wergirt û li cem wî zemînek guhdarkirnê ya dewlemend û curbecur ji bo kariyera wî ya hunerî ava bû. Wî di sala 1980’an de dest bi kariyariya xwe ya hunerî kir, bi stranbêjîyê, muzîk û lêxistina gelek amûrên muzîkê mîna (Okurdiyon, Urg, Ûd ,Cimbiş, Bizq û Tembûr) û dest bi stranbêjiyê di şahî û helkeftên herêmî de kiriye û tevlî gelek komên hunerî yên kurdî bûye yên taybetî ji bo lidarxistina ahengên cejnên Newrozan mîna koma Azadî, koma Biratî û koma Ahîn di dema ku strana kurdî bi qedexeyên giran ên siyasî û çandî re rû bi rû bû, lê wî israr kir ku muzîk amraza wî ya berxwedanê û derbirînê be. Wî ji bo Heskirinê, ji bo welat, ji bo azadiyê, ji bo bêrîkirinê stran gotine, ew ji hêla stranên xwe yên folklora kurdî û hesta xwe ya dilsoz a ku tevlîhev dike navdar e, gotinên stranên wî di navbera hêsaniya peyvan û kûrahiya hestiyariyê de tevdigerin, wî di xebatên xwe de trajediya Kurdan û hêviyên wan bi karanîne û vê yekê hişt ku ew bibe semboleke hunerî û nasnameyek xuya ji bo çanda Kurdî ya hevdem .

Di sala 1987’an de, hunermend, Şevger zewicî û ew neha bavê şeş zarokan e (kurek û pênc keç). Hunermend Şevger ew li gel şehsiwarên stranan Botanî yên mîna (Cemal Sadûn,Ismaîl Cuma, Azad feqe, Ronî Cezrawî.... jiyaye).

Şevger Mîrza di himbêza Dêrikê de mezin bûye, bajarê ku her wextî bibû minareya çand û hunerê û çavkaniyek ku namiçiqe ya hunermend û helbestvan, mîna (Ebdo Elanê, Mihemed Teyîb Tahir û Reşîd Elanê...) û kanîyeka zanîn û zanistê û dîdargeha ol û biratiyê, li wir, kanî bi giya re digihin hev û helbest bi awazan re dicivin, taybetmendiyên wî yên yekem hatine avakirin û giyanê wî vebû ji ritma cih û bedewiya wê re. Şevger li ser şûnwarên qijleya leşkerî ya fransî mezin bû, ku dîwarên wê şahidê dîroka kevnar û çîrokên jibîrkirî bû û di himbêza wê de wî henaseyên yekem yên zaroktiya xwe kişandin, ew ji tonên aşê kevnar fêrî awazên herî xweş bû û ji ringeringa zingilê Dêra kevnar xweşiktirîn ayat nivîsandin. Ji wêşiyên tiriyê mêwên li ser dîwarên xaniyên ax de xwe berdayîn wî gotinên stranên xwe jê wergirtin, ji himbêza Mizgefta mezin a Dêrikê, dengê bangdana mele Hemdî, li wijdana wî dixist, ku di bin bandora wê de helbestên xwe kûr û bi wate binivîsîne, ji xurxura ava kaniya eskeriyê awazên ku bi eşqa xak û bêrîya bîranînan jê werdigirtin, her tiştê li dora wî bibû amûreke muzîkê û her hûrgulî li bajarê wî bibû awazek di stranên wî de, bi vî rengî, ruhê Şevger hate damezrandin, ne ji dibistanek muzîka akademîk, lê ji xak û avên Dêrikê, ji naqos û bangdanên wê, ji kolanên wê yên teng û zeviyên wê yên ku ji hebûna gelê wê, zaravayên wê û pistepistên wê dirêj dike .

Ew li bajarê Dêrikê xwedêda û mezin bû, ku wî gelek jê hez dikir û bi hestek kûr û dilpak jêre distirand, ew wekî”kurê Dêrikê yê resen “dihate nasîn û yek ji sembolên herî berbiçav ên strana Botanî ya folklorî tê hesibandin û wî di muzîka kurdî de şopeke berbiçav hişte. Şevger Mîrza ne tenê hunermendek an jê bestekarek bû ku bi hûnandina peyvan û awazan dizaniya, lê ew dengek bû ku di hunera xwe de derbirîna nebeza gelê kurd dikir, ku bi rêya wê pirsgirêkên welat û miletê xwe bi dilsozî û dilpakî dianîn ziman. Bi rêya nivîs û awazên xwe, wî karîbû pirekî hunerî di navbera mîrateya borî û rastiya heyî de ava bike û avakirina muzîka kurdî ku kelepor, resenî û nûjeniyê bihevre biafirîne, stranên wî derd û kulên gel vedibêjin û serpêhatiyên wî di rûyê zilma jiyan û pirsgirêkên siyasî û civakî de belge dikin.

Ew beşdarî gelek çalakiyên çandî û hunerî û helkeftên neteweyî yên li Dêrik û herêmên din ên kurdî bûye. Afrîneriya wî tenê ji stranên xwe yên taybet re sînordar nema, jê zêdetir wî helbest dinivîsand û ji hunermendên Kurd ên din re awaz çêdikirin, wî hevkarî bi gelek hunermendên Kurd re dikir û desteka wî bi nemir Cemal Sadûn re cuda bû, wî di heman demê de gelek helbest nivîsandin û awaz ji wan re çêkirin ku ji hêla gelek hunermendên mîna (Azad feqe, Ronî Cezrawî, Nûhad Yusef, Wehîd Murad, Emîn Nadir, Ismaîl Cima, Haşim Mîrza) û Hunermendên din ên Kurd ve hatine gotin, ji stranên wî yên herî navdar, ku deng vedane û hunermendên Kurd strandine :

-Hunermendê nemir Cemal Sadûn gelek stranên wî gotine mîna:
1-Min navê te ser dil kola
2-Dêrika min şêrîne
3- Stêrka li ezmana
4-Bavê mezin Berzanî
5-Por belavê
6-Şêrîn yare tehil nabê
7- Çavê te yê şîn.

- Hunermend, Xebat Duhokî gelek stranên wî gotine:
1-Hey hey delala dilê min rabe derange.
2-Singe şovê

- Hunermend Azad Feqe: Gelek stranên wî strandine:
1-Lal kirim
2-Hat hat
3-Min tobe ye
4-Newroze
5-Ala Kurdî
6-Xwezî bo wê cama mey

- Hunermend Wehîd Murad komek ji stranên wî gotine û yên herî navdar e evin:
1-Dewere Govendê
2-Hat nîva govendê
3-Yara min çav beleke

- Hunermend Nûhad Yûsif çend stranên wî gotine, wek:
1- Min fal vekir.
2-Evîna te.
3-Hemî cih û warê em lê
4-Ji ber çavê te canê
5-Tuyî awaza vî dilî.

- Hunermend Emîn Nadir gelek stranên wî gotine, mîna :
1-Hoy hoy milet
2-Terka te nakim tucar
3-Ax dilê min
4-Xanima min
5- Adarek li min barî

- Birayê wî, hunermend Haşim Mîrza du albûm ji stranên wî gotine :
- Albuma yekem ku di 2001’an de hat weşandin, ji deh stranan pêktê, yên herî navdar:
1-Evîna te dilê min de dikelî
2-Kênê te şêrîn
- Albuma duyemîn sala 2006’an, di nav de deh stran û yên herî navdar:
1-Berbûdî çûn henê
2-Ez hijtedikim
3- Hey narê

Di heman demê de gelek hunermendên din ên Kurd gelek stranên wî gotine û di albomên xwe de tomar kirine û di aheng, helkeft û dewatan de hertim dibêjin mîna:
* Ronî Cezrawî: (Niza çawe te razîkim)
*Adil Feqe:(Dûrim dûrim)
*Ismaîl Cuma:(Kî bû destê xwe li deryê me da)
* Rêkêş Seyranî:(Dêrik xweşe seyrangehên dora wê).

Herwiha Nemir Şevger komek stran dane hunermend Bilind Ibrahim, Wehîd Murad û Ferhan Şero ku li ber tomarkirin û weşandinê ne. Piştî destpêkirina şoreşa Rojava di 2012 de, hunermendê nemir Şevger Mîrza bi malbata xwe re koçberî herêma Kurdistanê kir û li bajarê Dohukê bicîh bû û beşdarî gelek şevbuhêrkên stranbêjîyê û ahengên neteweyî bû. Stranên hunermendê nemir Şevger



ne tenê peyvên derbasbûyî bûn, ne jî awazên wî vehûnandinên muzîkîyên hêsan bûn, lê, dengê wî neynika ku êşên gel bi tevahî nîşan dide, bîranîna zindî ya dîroka têkoşînê wî dinivîsand û pirek bû ku nasnameya neteweyî û zimanê kurdî di rêya huner û mîrasê de diparast.

Di sibeha cejna qurbanê roja 6’ê Hezîrana 2025’an de, li nexweşxaneyek li bajarê Dohukê, hunermend Şevger, bi bêdengiya xanedanan jiyana xwe ji dest da û li pişt xwe mîrateyek wêjeyî û hunerî hişt ku dê di wijdana hijmekarên wî de zindî bimîne, laşê wî yê pak hate veguheztin û li bajarê wî û hezkiriya wî ya sermedî Dêrik ku wî ji axa wê hez dikir û wî ji deşt û zozanên wê re ji xelkên wê re bedewtirîn stran digotin, li wir li himbêza xaka ku jê hesdikir û wê jî jê hez dikir, li goristana Dêrikê bi merasîmek bi heybet ji hêla xelkên herêma Dêrik û hunermendên kurd ve hate oxir kirin.

Hunermend Şevger bi laşê xwe oxir kir, lê ew bi giyan, wêje û hunera xwe di wijdana kurdan de zindî dimîne.

Silav ji wî re yê ku ji hunerê berxwedan afirand û ji stranê bîranîn çêkir û Dêrik kire welatek zindî di her awazekî de. Silav ji tere di nebûna te de her wekî ku tu herdem amede bi dengê neyê jibîrkirin û bi bîranîna newê vemirandin. Hunermendê nemir Şevger ne tenê hunermendek, an stranbêjek yan jê bestekarek bû, ew dengek bû ku derdên kurdan di nav pêlpêlokên gewriya xwe de hildigirt, ew wijdanek hunerî bû ku di rêya gotin û awazên xwe re xewin, hêvî, azar, keyf û şînên mirovan pêkdianî, welatek tevahî di strana wî de dijya û ew bîrdankek bû ku pakîzeya awazê û rûmeta peyvê diparast. Bi çiwîna wî re, strana kurdî yek ji stûnên hunerî yên neliv wendakir, stranên wî ne tenê awazên keyf û şahîyan bûn, lê ew romanên gel bûn, sirûdên berxwedanê bûn, henaseyên evînê û banga azadiyê bûn.

Çûyîna Şevger Mîrza zerarek hunerî û çandî bû şûna wî nayê dagirtin, lê wî li pişt xwe mîrateyek hunerî ya nemir û şopek bêdawî ya li ser bîranîna strana kurdî hişt.

Çavên xwe deyne ser hev û rehet raze, tiştê ku te ji awaz û peyvan çandî, dê di dilê me de stranek bêdawî bimîne, tê sax bimînî û di dilê me de bijî heya ku Dêrik nefesê bikişîne û gelê Kurdistan stranên te vebêje. Ji bo ruhê te yê pak û temîz serbilindî û mandarî û ji bo mîrateya te ya neteweyî, wêjeyî û hunerî mayende û domdarî.



## Aqlê nû yê vê demê

**Remezan Olçen**

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a bi înîsiyatîfa Rêber Apo pêş dikeve rojeva sereke ye.

Gelê Kurd xwe li gorî perspektîfên Rêber Apo bi rêxistin dike. Di demeke wiha de Kurd careke din li dîroka xwe dizîvirin û dixwazin kêmasî û şaşiyên xwe dûbare nekin. Îro roj behsa aqlê Kurdî û îdeolojiya Kurdî tê kirin ku bi saya têkoşîna Apoyî çêbûne. Rêber Apo paradîgmayeke nû di aqilê siyasî yê Kurd û rêxistina civakî de pêş dixe.Ev jî di vê dema aloz a dîrokê de veguherînek radîkal dixwaze. Ev bang bersivek radîkal e ji bo krîza sazûmaniya pergala heyî.Rêber Apo ji bo îzahkirina paradîgmaya nû diçe destpêka çêbûna gerdûn û jiyanê.Piştre li dîroka cografya Kurdî vedigere. Di navbera gerdûnîbûn û xwecihîbûnê de analîzên xurt dike.

Ev ne tenê rêxistingeriyeke nû ya siyasî ye, ew herwiha aqlê Kurd û hêza berxwedana çandî ji nû ve înşa dike.

Bi Têgeha “aqilê Kurd” balê dikişîne nebûna aqilek neteweyî yê hevpar ê bibe bingeha rûbirûbûna domdar a Kurdan bi polîtîkayên qirkirin, asîmîlasyon û parçekirinê re.

Di vê çarçoveyê de, kevneşopiya konfederal a dîrokî ya ku ji Zerdeşt ve pêşketiye tê bibîrxistin.

Ev jî teqez dike ku ne avahiyên arîstokratîk-dewletparêz, lê rêxistinên komunal û demokratîk, dikarin yekîtiyê di civaka Kurd de biafirînin.

Rêber Apo pirsgirêka herî bingehîn a Kurdan bi êrişên derve re îzah nake.

Tevî van aliyan ji wan zêdetir li ser meseleya îxaneta hundirîn, ‘judenratiyê’ analîzan dike.

Vê rewşa îxanetkar jî weke sergo destnîşan dike.Li gorî Rêber Apo aqlê judenratbûyî sersebebê êş û azarên Kurdan e.Rêber Apo dide zanîn ku rewşenbîrên Kurd di roja îro de jî aqlê judenratî û îxanetkariyê lêkolîn nakin, ji ber vê jî siyaseta rojane jî kûr nabe.

Rêya derketina ji vê rewşê jî Rêber Apo wiha destnîşan dike: Çêkirina aqlê Kurdî ji bo xwe û îdeolojiyeke Kurdî. Ev li ser esasên derbaskirin û têkbirina Kurdên îxanetkar û judenrat tê pêşniyazkirin.

Rêxistingeriyeke li dora aqlê Kurdî bi vî awayî tevgerbûyî û îdeolojîk dikare paşeroja gelê Kurd jî destnîşan bike.

# Di vîna xwe de bi israr in...

Jîyan Pîranî

Dîrok çerxek zêrîn e, pêwîst e em li gorî rûpelên dîrokê bijîn. Divê em ji bîr nekin tişta ku em îro dijîn û dinivîsin, dîroka me ya pêşerojê diyar dike. Taybet wek ciwanê Kurd em hertim gazincan ji pêşiyên xwe dikin ku çima, pêşerojek ronî ji bû me dabîn nekirine û çima dîroka me ya hatiye jiyîn nehatiye nivîsandin? Bê gûman gotin û gazincên pêşiyên me hertim ji jiyana me ya ji rêzê bi watetir bûne. Ji ber ku ew di nava pencên zalim û xwînmijan de hatibûn fetisandin, dûrî çand, nasname û zimanê xwe hatibûn hiştin. Li ser vî bingehî jî, bi hezaran zarok, ciwan, kal û pîrên me derberderî welatên biyanîbûn û ji heyîna xwe hatin dûrxistin. Ji bo ku em bibin xwedî pêşerojek ronî û dîrok dewlemend. Di salên 1970'an de li paytexta dijmin ango di nava dilê dewleta Tirk de Rêber Apo têkoşînek ya guhertin û veguhertina gelê Kurd da destpê kirin. Ev guhertin û veguhertin ji bo tevahî gelê Kurd bû bingeha têkoşîna doza azadiyê. Pêl bi pêl li deşt û zozanên Kurdistanê belav bû. Bi taybetî jî herêma Botanê ku bi serhilderêya xwe tê nasîn bû, di heman demê de jî herêmek stratejîk ya vî şerî û vê têkoşînê bû. Ji bo wê jî dewleta Tirk ya dagirker bi hemû hêz û alavên xwe yên leşkerî êrişî gundiyên Botanê yê li ser sînor kir. Van gundiyan li hemberî êrişên tinekirinê yên dewleta Tirk li berxwedan û gav



bi şûnde ne avêtin. Dema dewleta Tirk ev yek dît, ji tiştên werin jiyankirin tirsiya û du rê danî ber van gundiya û got: 'Yan hûnê bibin cerdevan li hember gerîlayan şer bikin, yan jî hûn neçarî ji axa Tirkiyê derkevin.' Bê gûman wê demê 16 hezar kesan berê xwe da rêya penaberiya û ber bi Başûrê Kurdistanê ve bi rê ketin. Di nava sînorên penaberiyê de jî dewleta Tirk, PDK, Neteweyên Yekbûyî û niha jî dewleta Iraqê zextên tinekirina li ser van penaberan daye ber xwe. Ji Bihara 1994'an heta niha ev gel rastî hemû bê mafiyan hatiye û heta niha jî tê. Di dîroka penaberiyê de zarok, hevjîn, dayîk û bavê wan li ber çavên wan bi hovan hatin qetilkirin. Bi mehan bê nan, bê av û pêxas hatin hiştin. Bi salan di girtîgehan de man û êşkence û zext li wan hatin kirin, lê wan ji berxwedan û têkoşîna xwe tawîz nedan û nadin jî.

Herî dawî di Gulana 1998'an de ber bi Wargeha Penaberan a Mexmûrê ve bi rê ketin û li Mexmûrê ya ku bi derdorê wê çolistan bû niştecih bûn. Êdî ev wargeh wargeha dawî bû. Li vir jiyanek li gorî şert û mercên xwe ji bo xwe ava kirin. Mîna ku zarokek nû fêrî gav avêtinê bibe, vî gelî jî gav bi gav xwe fêrî jiyana vê çolistanê kir. Ji bo ev wargeha were belav kirin û vala kirin dewleta Tirk, PDK û Neteweyên Yekbûyî gelek hewldan kirin . Her carê di bin hincetek cûda de êrişî vê wargehê kirin û pêwîstiyên wan yên jiyanê nehatin dabîn kirin. Di dîroka 2014'an de piştî êrîşên çeteyên DAIŞ'ê bi hinceta ku jiyana me di metirsiyê de ye berpirsên Neteweyên Yekbûyî destê xwe ji wargehê kişand. Êdî bi vê dest kişandinê re pirsgirêkên wargehê destpê kirin. Nasnameyên wargehê yên penaberiyê di demê xwe de nedihatin nûkirin û ti alîkarî ji bo wan ne dihat kirin. Di Tirmeha 2019'an de ji bo ev wargeh were vala kirin, PDK'ê dest bi ambargoyekê kir. Di pêvajoya ambargoyê de rêjeyek mezin karkerên wargehê yên li bajarên herêma Kurdistanê kar dikin, bê kar man. Her wih bi dehan dayîkên ducanî di xalbendên ewlehiyê yên PDK'ê de hatin ragiritn û zarokên wan jiyan xwe ji dest dan û bi sedan nexweşên wargehê ji wan xalbendan de li paş de hatin vegerandin. Du hemwelatiyên wargehê yên di vê pêvajoyê de ji aliyê PDK'ê ve hatibûn dîlgirtin di girtigehê de jiyan xwe ji dest dan. Lê cardin jî êrişên KDP'ê negihiştin armanca xwe.

Di nava vê ambargoyê de bi dehan caran dewleta Tirk ya dagirker êrişên balafirên bêmirov, li ser gelê wargehê pêkanî û bi dehan hemwelatiyên vê wargehê jiyana xwe ji dest dan û birîndar bûn. Her kes li hemberî vê bêrêzî û zilma li vî gelê dihatkirin, bêdengiya xwe diparast. Ev du salin nasnameyên gelê wargehê yên penaberiyê nayên nûkirin, ji ber vêpirsgirêkê gelek caran karker û nexweşên wargehê rastî astengiyên leşkerên Iraqê dihatin. Herî dawî ji 10'ê Nîsana 2025'an de Hikûmeta Navendî ya Iraqê ambargoyek li ser gelê wargehê ferz dike. Di wê çarçovê de nûnerên xelkê Wargeha Penaberan a Mexmûrê ku ji bo van pirsgirêkan çareser bikin çûbûn Bexdayê, dirêya vegerê de hatin girtin û 37 rojan di girtigehê de hatin ragirtin. Dibe ku nûnerên wargehê hatibin berdan, lê belê heta niha jî ti pirsgirêkên wargehê ne hatin çareserkirin û hîna jî di rêyan de ji bo karker û nexweşan pirsgirêk derdixin. Dewleta Tirk destpêkê xwest bi rêya Neteweyên Yekbûyî gelê wargehê teslîm bigre, lê bi serneket. Gava duyem bi rêya PDK'ê dest bi planên xwe kir, vê carê jî dest vala zivirî û niha jî dixwaze bi rêya dewleta Iraqê gelê wargehê teslîm bigre û ji mafê wê bêbehr bike. Lê dewleta Tirk ne di ferqa hêza vî gelî de ye ku çawan di salên 1994'an de li hember êrişên wan serî netewandiye û wê îro jî li hemberî êrişên ti kesê serî netewîne!!!!



## Şêx Seîd II

Hafiz Ahmet Turhalli

Raperîna Şêx Seîd û cangoriyên sala 1925'an ji bo gelê Kurd, bûn ruhê berxwedana li dijî Tirkbûnê û çira azadiya welatê Kurdistanê. Navê Şehîdên sala 1925'an di dîroka camêrî û mêrxasiyê de hate nivîsîn. Bêguman li Kurdistanê, gellekî şêx, mîr û melayên mezin jî hebûn, lê kesê di dîrokê de, weke şêx û pêşengên sala 1925'an cîh negirt. Her çiqas neyarên gelê Kurd bi hevkariya hemû hêzan xwestin wan tunne jî bikin, ew di dilê milletê me de zindî man. Wek Xweda di Qur'ana pîroz de dibêje:"Kesên di rêya Xwedê de (ji bo heqiyê) hatine kuştin, nebêjin ew mirîne. Na; ew zindîne, lê hûn tê nagîhîjin." (Beqere 154)

Belê heqîqeta vê ayeta han em îro jî berçavên xwe zindî dibînin. Kesên dewlemend, zana û desthelatdar dimrin, nêviyên wan navên bapîrên xwe nizanin.

Lê weke Xweda jî gotiye; kesên ji bo maf û çarenûsa xwe tevdigerin, ji bo rastiyan û heqîqetan têdikoşin û dimrin, di dilan de û mêjiyan de Xweda ji wan re cih çêdike.

Her çiqas mezelên wan ne diyarbin jî, ew di quncikên dilan de û di nava mêjiyên paqij de, cihêkî xwe yê sereke girtine.

Ez dixwazim balê bikşînim ser nîqaşên ku dibêjin, Şêx Seîd û hereketa wî ne hereketekî netewî bûne: Ev nîqaş û berovajîkirin, ji bo reşkirina mafê Kurdan û milletê Kurd e. Weke mînak: Çima kesekî ji bo şêx Şamîl nabêje; ji bo ûmmetê kar kir û şehîd bû? Çima kes Ji bo Omer El Muxtar nabêje, wî ji bo ummet kar kir û şehîd bû? Ev guftugo û nîqaş jî, perçeyek ji şerê psîkolojîk ku ji bo Kurdan û Misilmanan berahev bidin tên pêşxistin. Dema misilmanên dîtir ji bo azadî û xelasbûna millet û welatê xwe kar dikin, egîdin, mucahîdin û pakrewanin. Çima ev tişt ji bo Kurdan derbas nabe?

Gelo çima Şêx Seîd: ji bo şêx, mîr û begên Kurdan nameyan dişeyne, ji wan alîkarî û hevkariyê dixwaze? Lê çima ji şêx, mela, muftî an alimekî Tirk, Fars û ji Erebekî alîkarî û hevkariyê naxwaze?

Divê ev pirs, bi awayekî durust werin bersivandin. Em di meseleya Kurd û Kurdîstnê de, berovajîkirin, şilokirin, şerê psîkolojîk û xapandinên herî kîret, mixabin kesên an cemaetên bi navê Îslamê deng dikin de dibînin û dijîn. Kesên qaşo navê cemaaetên Îslamî an kesayetên oldar ku ewjî piraniya wan bi esil Kurdin, di sedsaliya darvekirinê de jî, tu tişt nekirin. Ka kîjan cemaet an kesayetên ji xwe re dibêjin em Misilmanin, doza hestiyên Şêx Seîd û hevalên wî kirine? Ma ger em birayê hevdu yên olî ne; gelo çima ji bo kesayetên dij sîstema Kemalîst têkoşyane û cangorî bûne, tu dengekî nîne? Ev hemû berovajîkirin û munafiqtiya van hêl û terefane.

Kurdan ji bo sedsaliya sêdarekirinê gellekî konferans û çalekî pêş xistin, doza hestiyên bapîrên xwe kirin.

Lê tu kes an cemaetekî bi navê ola Îslamê piştgirîya Kurdan îro jî nekirin! Sedem ji ber Şêx Seîd û hevalên wî rêberên Kurdan e: Li ba wan hê jî Kurd nezanin û divê werin xapandin. Ew tişt çû: nema Kurd tên xapandin. Kurdan bi bizava netewî ya hemdem, bêhna azdiyê hildane, nema jê vedigerin. Sed rehmet li gorên we be, şehîdên doza me. Em ê gorên we çêkin û li ser qebrên we Fatîha azdîya Welatê xwe û mirina neyarên xwe bixwînin.

# Welatparêzî

Roheyv Keleş/ Qamişlo

**Welatparêzî hezkirina welêt û parastina wê bi şêweyên mirovahî û exlaqî ye. Mirovê welatparêz, nirxên civakî, sincî, siyasî yên gel û welatê xwe diparêze.**

Li gorî Nathanson têgehên bingehîn ên welatparêziyê; hezkirina taybet a welat, hesta xwe bi welatê xwe danasandin, hezkirina tenduristiya pêşerojaya welat û ji bo başiya welatê xwe fedakarî ye. Li gorî Virolî, welatparêzî hurmetnişandana tarza jiyanê û saziyên polîtîkayê yên azadiya gelan li ser piyan dihêle.

**Hin helwestên bi welatparêziyê ve girêdayî hene, ew jî ev in:**

-Xwesteka parastina xwezaya welat û bingeha çandê.
-Serbilindî bi destkeftî û çanda neteweyî.
-Hesta nasnameya kesî li hember welêt.
-Ji bo berjewendiya welêt amadebûna xwefedekarî.
-Hezkirineke taybet ji bo welatekî.

**Bandorên exlaqî yên Welatparêziyê hene ew jî ev in:**

-Hesabkirina neteweya xwe ji neteweyên din girîngtir.
-Girtina berjewendiya gel li ser berjewendiya xwe.

**Aliyê Exlaqî ê Welatparêzî**

Gelek kes bawer dikin ku welatparêzî hestek xwezayî û guncaw e ku ji girêdana mirov bi welatê ku lê ji dayik bûye û lê jiyaye derdikeve hole, herwiha şiklek ji şiklên spasdariyê ji bo feydeyên ku vî welatî ji wî re aniye mîna jiyankirina li ser axa wê û di nav welatiyên xwe de û di bin qanûnên xwe de, herwiha nirxandina welatparêziyê wekî beşek girîng a kesayetiyê. Hin kes welatparêziyê wekî ferzek exlaqî û nevenda exlaqê dibînin, lê belê felsefeya exlaqî ku exlaqê wekî gerdûnî û di bingeh de bêalî şîrove dike, têgehên girêdana herêmî ya qismî û wefedariyê ji hole radike, alîgerên vê komê meyla wan heye ku welatparêziyê wekî cureyek ji xweperestiyê kolektîf dihesibînin.




**Welatparêzî ji bo gelên blindest xwedî wate ye**

Welatparêzî, bi taybet ji bo gelên bindest ku xaka wan hatiye dagirkirin, xwedî wateyeka grîngtir e. Lewra dema hestên welatparêziyê di nav gelekî bindest de xurt nebin, pêş nakevi, ev jî bi rêxistinkirina civakê dibe, tu derfeta rizgarkirina wî gelî ji bindestiyê û rizgarkirina wê axê ji dagirkeran, hema bêje nîne. Ji ber rastiya bindestiyê û grîngiya rizgariya ji bin wê bindestiyê, pîvan û mercên welatparêziya gelên bindest jî pir berfirehtir û girantir e. Beriya her tiştî, di vê welatparêziyê de berjewendî û hesabên ferdî nikarin hebin. Ji xwe dema hebin, ew nikare bibe welatparêziya resen jî. Ev welatparêzî bêtir fedakarî û jixwedayîn dixwaze. Ew jî têre nake; li gel vê divê welatparêzek bi her rengî dijminê xwe red bike. Ango welatparêzî bi her rengî reda dijmin e. Her wiha xwedîlêderketina hemû nirx û rûmetan e ku ji dîroka wî gel û civakî, li ser wî xakî herikîne û kom bûne, di serî de jî ziman.



# 'Rêber Apo ji bo ciwanan bûye koka jîn û jiyanê'

Ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar kirin ku ew dixwazin nêrînên xwe bi Rêber Apo re parve bikin, bi wî re nîqaş bikin û gotin, "Em ê Kampaniya "Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim" li tevahî cîhanê belav bikin."


Birûc Resûl/Qamişlo

Kampaniya "Ez dixwazin bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim" ku di destpêka Hezîranê de ji aliyê Forma Azadî û Aşîtiyê ya Ewropayê (EFFP) ve hatiye destpêkirin, berdewama pêngava "Ji Abdullah Ocalan re azadî ji pirsgirêka Kurd re çareserî ye" ye. Ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştgiriya xwe ji kampaniya "Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtin bikim" re anîn ziman û gotin ku bi saya fikr û ramanên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan her netewek di bin projeya Netewa Demokratîk de xwe birêxistin dike û xwedî li ziman, dîrok û nasnameya xwe derdikeve.

Ciwanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên bi navê Şukrî Mihemed û Ehmed Elî Dawûd ji Rojnameya me re behsa Kampaniya "Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim" kirin.

**'Her kes bi fikrê Rêber Apo bandor dibe'**

Şukrî Mihemed di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku pêwîst e ew despêkê enacama keda di



Şukrî Mihemed

Pêngava Cîhanî ya "Ji Rêber Apo re Azadî û Ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî" baş fêm bikin û wiha pêde çû: "Pêngava Ji Rêber Apo re Azadî û Ji Pirsgirêka Kurd re Çareseriya Siyasî " bû pêngaveke gerdonî ku her kes bi vê pêngavê bandor bû, di heman demê de bi hezkirineke mezin ji bo azadiya Rêber Apo a fîzîkî tevlî bûn. Bi vê yekê tê diyarkirin ku Rêber Apo fikrê xwe belavî hemû cîhanê kiriye. Rêber Apo ji bo azadiya jin û gelan bûye stûn, Rêber Apo ji bo me û tevhî ciwanên cîhanê re bûye serkeftin û azadî. Em bi fikrê Rêber Apo xwe tevlî jiyanê dikin da ku em vê jiyanê baş fêm bikin. Em heya vê kêliyê û heta dawiya jiyana me jî azadiya Rêber Apo daxwaz dikin. Roj bi roj xwesteka me ya hevdîtinê bi Rêber Apo re mezin û hêrstir dibe. Herî zêde piştî pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk Rêber Apo bi peyam û nameyên



Ehmed Elî Dawûd

xwe çareseriya Rojhilata Navîn nîşan dike."

**'Ev kampanî girêdana me bi Rêberê me re nîşan dike'**

Şukrî di dawiya axaftinên xwe de wiha got: "Em dixwazin nêrînên xwe bi Rêber Apo re parve bikin û bi Rêber Apo re nîqaş bikin da ku em hîn zêdetir ji Rêberê xwe fêr bibin. Ev kampaniya ku bi sernava "Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim" vê yekê nîşan dike û girêdana me ya xûrt jî bi Rêber Apo re diyar dike. Em ê careke din bihêlin ku ev kampanya li giştî bajarên cîhanê were belav kirin. bi dehan kesê xwedî zaniest û lêkolîner çareseriya pirsgirêka Rojhilata Navîn di kesayetê Rêber Apo de dibînin. Pêwîst e em gavek nû di jiyana xwe de bavêjin, him di aliyê exlaqê civakê û aliyê şerê desthiladaran yên ku civaka me talan dikin. Ev yek jî çareseriyên wê di fikrê Rêber Apo de ye. Hêviya me ew e ku her kes Rêber Apo nas bike û pirtûkên Rêber Apo bixwînin."

**'Fikrê Rêber Apo bûye koka jîn û jiyanê'**

Ehmed Elî Dawûd têkildarî mijara kampaniya "Ez dixwazim bi Rêber Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikim" wiha axivî: "Ev çalakiyên ku ji bo Azadiya Rêber Apo tên lidarxistin li tevahî cîhanê tê belavkirin. Rêber Apo fikrê xwe di serê her mirovekî aştîxwez de çandiye ji ber ku fikrê Rêber Apo bûye koka jîn û jiyanê. Gavên ku em niha ji bo Azadiya Rêber Apo diavêjin pêş, ne tenê li ser asta Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, belê em li ser asta giştî cîhanê vê gavê diavêjin. Ez wek ciwanê bi fikrê Rêber Apo bandor bû me, ez pir dixwazim hevdîtinê bi Rêber Apo re bikim. Ji ber ku kesê maf û daxwazên ciwanan pêk anî ye Rêber Apo ye. Bi keda Rêber Apo gel bû xwedî hêz û xwedî êradeyekî xurt da ku mafê xwe bi dest bixe, li dijî desthiladaran serî hildin. Gelê Kurd yê ku nikarîbûn gotenkê bi zimanê xwe bikin, bi fikrê Rêber Apo niha bûye yek ji gelên herê berxwedêr û têkoşer. Raste Rêber Apo bi fîzîkî di zindanê de ye lê fikrê Rêber Apo her dem di nav me de zindî ye û ji bo me bingiha jiyanê ye."

**'Rêber Apo ji bo jin û gelan kir bingeha azadiyê'**

Ehmed di herî dawiyê de wiha anî ziman ku dixwaze Rêber Apo bi fîzîkî bibîne û ji kesayeta Rêber Apo hêz bigre û wiha got: "Em dixwazin her dem ji bo azadiya Rêber Apo têkoşîn bikin û hêvîya me ji bo tevahî ciwanan jî ku bi firkê Rêber Apo tevlî jiyanê bibin û xwe pêş bixin. Fikrê Rêber Apo hêjaye ku mirov di her zehmetiyan de derbas bibe da ku ji vî fikrî fêr bibe. Rêber Apo xwe ji bo jin û gelan kir bingeha azadiyê. Piştî namyên Rêber Apo ji bo gel û jinan gavek nû hat avêtin. Ev gav jî bi felsefeya Rêber Apo ye, di vî hawî de em dixwazin bi Rêber Apo re hevdîtin bikin. Em wek Ciwanên şoreşger dixwazin Rêberê me azad bibe û di nav me de jiyana xwe berdewam bike."

# Li Kobanê Fakulteya Zanistên Civakî hate vekirin

Lîloz Hisên/Qamişlo

**Berpirsê Zanistên Civakî Ridwan Mihemed Elî diyar kir ku girêdanek di navbera nameya Rêber Apo û vekirina Fakulteya Zansitên Civakî heye û wiha got: "Rêber Apo dibêje 'divê Zanîngeha Kobanê di bin fikrê neteweya demokratîk de tev bigere'. Li ser vê xetê me jî dest bi vekirina vê fakulteyê kir."**

Di 29'ê Pûşperê de, di komxebatê de ku li ser felsefeya neteweya demokratîk li bajarê Kobanê hate li dar xistin û piştî silavên Rêber Abdullah Ocalan ji bo zanîngeha Kobanê; di komxebatê de vekirina fakulteya Zansitên Civakî hate raghandin.

Derbarê hûrgûliyên raghandina vekirina fakulteya Zansitên Civakî berpirsê di vî warî Ridwan Mihemed Elî destnîşan kir ku ev zêdtirî salekê li ser vê projeyê kar û xebat têne kirin û wiha got: "Sedema derengmayîna vekirina fakulteyê, ji ber nebûna mamosteyên pispor di vî warî de, lê belê herî dawî mamosteyên pospor hatin amadekirin."

Ridwan Mihemed Elî tekez kir ku pêwistiyeke pir giring hebû ku zanistên civakî bi zimanê dayikê di perwerdeyan de bê dayîn.

**'Fakulte wê civakê ji xwe re esas bigre'**

Ridwan Mihemed Elî wiha berdewam kir: "Zansitên Civakî wê bi rengekî resen ku civakê ji xwe re esas bigre bê dayîn, herwiha felsefeya Netewa Demokratîk ku li her sê zanîngehên me li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê dayîn. Girêdaneke di navbera vekirina fakulteyê û nameya Rêber Apo de heye, Rêber Apo silavên xwe ji zanînghê re şand û dibêje 'divê zanîngeha Kobanê di bin fikrê neteweya demokratîk de tev bigere', lewma divê em vê yekê pêk bînin, li ser vê riyê bimeşin û dest bi perwerdeyan bikin."

Ridwan Mihemed Elî îşaret bi komkujî û paşgukirina ku li ser gelê kurd hatine kirin; kir û wiha anî ziman: "Îro em derfetê bidin Zansitên Civakî da ku pirsgirêkên di nava civakê de çêdibin, analîz û lêkolîn bikin."

**Sîstema fakulteyê**

Ridwan Mihemed Elî derbarê sîstema fakulteyê wiha got: "Dê pênc beş di nav xwe de bigire (Felsefe, Zanistên Civakî, Jineolijî, Dîrok û Erdnîgarî) Sîstema hînkirinê dê sîstemek "zanîngeha hevbeş" be. Di du salên pêşîn de, xwendekar bi hev re dersên giştî yên zanîngehê dixwînin. Di salên xwe yên dawîn de ji sala 3 destpê dike ku xwendekar beşê ku bixwaze hilbijêre da ku tê de pisporiya xwe temam bike."

**Wateya Zansitên Civakî**

Ew komeke dîsîplînên akademîk e ku têkiliyên di navbera takekesan û civakê de lêkolîn û analîz dikin, şêwazên civakî, aborî û siyasî vedikolin, pirsgirêkên civakî, di nav de erdnîgarî, dîrok, felsefe, siyaset û yên din çareser dikin. Ew rasterast têkiliyên civakî, pirsgirêk û çareseriyên ku ew ji civakê re derdixe holê lêkolîn dike û perspektîfên pêşerojê ji bo pergalên civakî pêşkêş dike. Hêjayî gotinê Zanîngeha Kobanê di sala 2017'an de hatiye avakirin, beşên zansitî û fakulteya wêjeyî ya zimanê kurdî hebû, bi desrbasbûna salan beşên dîtir lê hate zêdekirin.

**Pilanên piştî raghandina fakulteya Zanstên Civakî**

Sîstema fakulteyê wê bê temamkirin, weke hilbijartina hevserokên fakulteyê. Amadekirina meteryalan, pilanên dersdayînê wê bêne amadekirin. Qebûlkirina xwendekaran di fakulteyê li gorî pîvanên ku bêne diyar kirin. Danûstendina bi zanîngehên herêmî û navdewletî wê bê kirin weke zanîngeha Bremen.



Sîstemên zanîngehên herêma Bakur û Rojhialtê Sûriyê, çi zanîngeha Rojava, Şerq û Kobanê hevbeş in û bi hev re xebat dikin.

Zanistên civakî berî niha di zanîngeha Kobanê de weke meteryalên zanistên civakî dihat dayîn û hîn jî wê berdewam bin, meterylên ku dihatin dayîn ev bûn (Bingehên Zansita Civakî, Dîrok, Netewa Demokratîk, Jineolojî) her yek ji van meteryalan cuda dihatin dayîn, weke meteryalên giştî di zanîngehê de nav lê tên kirin. Xwendekar di çi beşî de bixwîne wê ev meteryal sabît bin.

# ‘Rêber Apo hezkirina welat di dilê me de ava kir û em bûn aşiqê azadiyê’

Kesên ku di demên berê de bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re civiyan, xwe bi wan civînan bi serbilindî nîşan didin û radighînin ku ew civîn ji bo wan pir bi nirx û hezkirina ji dil ya welatparêziyê di giyanê wan de çand. Lewra ew azadiya Rêber Abdullah Ocalan çareserkirina hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn, dibînin.

**Nalîn Ehmed/Qamişlo**

Ji beriya 50`î salî ve, di destpêka avakirina Partiya Karkerên Kurdistanê PKK’ê hejmareke mezin ji welatiyan li gel Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hevdîtin pêk anîn. Bi taybetî piştî hatina Rêber Abdullah Ocalan ya li Şamê û Lubnanê bi hezara welatiyên Rojava ji bo hevdîtinê tevlî hemû zehmetiyan, berê xwe didan Şam û Lubnanê. Tevlî salên dirêj ji pêkanîna wan hevdîtinan lê heta niha ew bîranîn di dil û mejiyê welatiyan de maye. Çimkî diyar dikin ku bi saya fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan û civînên ku dihatin li darxistin, hezkirina welat di hundirê wan de da avakirin.

### Ji bîst saliya xwe û heta heftê saliya xwe hezkirê felsefeya tevgerê ye

Xwediyê helbesta Vaye PKK Rabû Li Deşt û Çiya Belav bû, welatparêz Kurd Tac-Eldîn Hisên ku bi navê bavê Mezlûm tê naskirin, ji gundê Til Meyre yê girêdayî bajarê Hesekê ye niha bi temenê xwe 72 salî ye, ew yek ji wan kesên ku gelek caran hevdîtin bi Rêber Abdullah Ocalan re pêk anî. Hevdîtin ji beriya 50`î salî pêk hatine lê dema ku behsa hevdîtinên xwe dike tê bêje di wê demê de dijî. Tac-Eldîn piçûkaniya xwe li gund derbas dike, heta temenê wî digihêje yêleşkeriya ilzamî. Di bîst saliya xwe de piştî ku leşkriya xwe ya rejîma Esaad diqedîne ji bo xwedîkirina malbatê heriwha ji bo jiyaneke nû ji xwe re ava bike, berê xwe dide Erebistana Siudiyê û li wê derê dest bi karê ajokariyê dike. Tac-Eldîn di wê demê de bi doza Rêber Abdullah Ocalan û rêhevalên wî dibihîze û pê kêfxweş dibe. Li Siudiyê Tirkan li gelek cihan wêneyên Rêber Abdullah Ocalan belav kiribû û doza radestkirina wî dikir. Di wê demê de wîû hevalên xwe bi awayekî veşartî li hev diciviyan û hevalekî wan ku ji Bakur bû behsa doza Rêber Apo bi berfirehî ji wan re dikir.

Derbarê hevdîtinên xwe yên bi Rêber Abdullah Ocalan re Tac-Eldîn Hisên ji rojnameya me re axivî.

### Hevdîtina yekê


Piştî salekê Tac-Eldîn ji bo bi xwestiya xwe re bizewice, biryarê dide ku vegere Sûriyê. Di demên



berê de wekî niha balafer zêde nîn bû, lewra mirov neçar diman ku bi erebeyan ji Siûdiyê biçin Sûriyê. Tac-Eldîn Hisên ji ber di rê de westiya bû li Şamê li gel mala mirov xwe çend rojan dimîne. Li wê derê ew behsa dos û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan û rêhevalên wî, ji xwediyê male re dike. Bavê Mezlûm dibêje: “Me li Siûdiyê bihîstiye ku hejmarek ji ciwanên Kurd rabûne ser piyan û doza Kurdistaneke serbixwe dikin.” Piştî gotina xwe bidawî dike xwediyê malê û mêvanên wî pê dikenenin Bavê Mezlûm pir ji wan aciz dibe û wiha axaftina xwe berdewam dike: “Kenê we ji bo çiye, dema min wiha got xwediyê malê ji min re got tê îşev mêvanê me be û wê hin mêvanên me jî werin wê demê emê behsa vê mijarê bikin. Dema bû êvar min dît mirovekî wiha bi heybet derbasî odeyê bû ez şaş mam min ji xwe re got gelo ev ne ew kesê ku wêneyên wî li Siûdiyê belav kirine. Min jê ne pirsî heta roja duduyan, piştî me taşteya xwe xwar min dît wî kesî xwe dirêj kir û çend pirtûk danî pêşiya xwe. Min ji xwe re got hema ez jê bipirsim gelo tu ne Abdullah Ocalan e. Çend deqe derbas bû min nema xwe girt di wê demê de gotina heval û serok nîn bû me ji hevre digot bire, lewra wê demê min jê re got, bira min wêneyên te li Siûdiyê hatiye belavkirin dewleta tirk dixwaze te bide girtin. Dema min wiha got, Rêbertiyê matmayî ma û pirtûka xwe ji destê xwe danî. Min jê re got ma ez kîmim, min jê re got ti Abdullah Ocalane serokê Partiya Karkerê Kurdistanê pkk`ê ye. Ji min re got neyse ka ji min re bêj ti li Siûdiyê çi karî dike. Min behsa kar û civînên xwe jê re kir, ew pir kêfxweş bû.”

### Piştî 50`î salî gotinên helbesta wî pêk tê

Di sala 1973`an de dema ku Tac-Eldîn leşker bû rojekê radyoyê guhdarî dike dibihîze ku behsa serhildana ciwanên Bakurê Kurdistanê tê kirin ku ji bo Kurdistaneke ser bixwe li hember dewleta Tirk li ber



xwe didin. Bavê Mezlûm ji kêfa dest bi nivîsa helbestekê dike hema bi çend malikan wiha dinivisîne `Vaye xurtê kurdan rabûn li deşt û çiya belav bûn`.

Piştî hevdîtina Tac-Eldîn bi Rêber Abdullah Ocalan re û naskirina wî ya ji pkk`ê re hezkirina wî zêdetir dibe çareke din helbesta wî tê bîra wî û bi alîkariya Hunermendê Kurd Xelîl Xemgîn ew helbesta xwe sererast dike û dike stran li tevahiyê cîhanê tê belav kirin.

`Vaye pkk`ê rabû li deşt û çiya belav bû kulîlkên welat sor bûn bilbil û kulan şa bûn`

### `Kar û xebata Pkk`ê ji bo azadiya tevahiya milatê bindest e`

Tac-Eldîn Hisên beriya ku Rêber Apo bibîne wî pir ji fikir û doza wî hez kiribû. Herwiha dema ku li Siûdiyê wêneyê Rêber Abdullah Ocalan dibîne pir ji heybeta wî hez dike. Bavê Mezlûm wiha behsa hevdîtina xwe ya yekê dike: “Hevdîtin û civînên ku me bi Rêbertiyê re çêkir wateyeke nû da jiyana min, lewra bi fikir û felsefeya Rêber Apo em ji bindestiyê azad bûn û me jiyaneke aad ji nifşên xwe yê nû re ava kir. Di wê demê de di dawiya sala 1979`an de gelek partî qaşo ji bo rizgarkirina axa Kurdisatanê hatin birêxistin kirin, lê karê wan zêde bandor li mirova nekir. Lewra xebata wan zêdetir berjewendiyê şexsî bûn. Cûdahiya tevgera azadiyê ji partiyên din ev e ku, ew ne tenê ji bo gelê Kurd li ber xwe didin ew ji bo jiyaneke azad û parastina mafê hemû pêkhateyan bi dehê salaye têkoşîn dikin.”


### `Rêbertiyê jin ji desthilatdariyê rizgar kir`

Hisên behsa gelek bûyer û kar û xebata xwe ya di nava tevgera azadiyê de kir bi taybetî di demên rejîma Esaad e. Bi çi rengî kar dikirin ji bo naskirina xelkê ji partiyê re. Herwiha bavê Mezlûm bi xwe gelek caran ji aliyê rejîmê hatiye dîlgirtin.

Li ser fikir û felsefeya Rêberê Abdullah Ocalan Tac-Eldîn wiha axivî: “Piştî Şoreşa Rojava û destkeftiyên ku gelê me bi xwîna keç û xurtên xwe bi dast xistîn, ne tenê ji partî û rêxistinên din yên Kurdî re hat diyarkirin ku yê xwedî maf û xwedî doz Pkk`ê ye. Ev yek ji tevahiya cîhanê re hat diyarkirin. Bi taybetî nêzîkatiya vê partiyê ji jina re. tik es nikare vê yakê înkar bike ku bi saya felsefeya Rêbertiyê jin ji bindestiyê rizgar bûn. Ne tenê jinên Kurd na tevahiya jinên ku gihiştina baweriya felsefeya Rêber Apo. Lewra Apo jin di civakê de kir xwedî roleke pir mezin û hişt ku di hemû qadên civakê de bibe xwedî roleke girîng.”

### `Azadiya Rêbertiyê çareserkirina hemû pirsgirêka ye`

Welatparê Tac-Eldîn Hisên li ser rewşa dawî û banga Rêber Apo ya di 27`ê Sibata îsal de ya `Aşitî û Civaka Demokratîk` axaftina xwe bidawî kir: “Ji bo parastina destkeftiyên Şoreşê û kar û xebata bi sala Rêberitê banga aşitî û demokratiyê kir. Ev tê wateya ku heta Kurdistan neyê rizgarkirin wê şer û pevçûn berdewam bike. Ne ji hezkirina me ji kuştin û şer re heye na, lê heta gelê me negihêjin mafê xwe û li her çar perçeyên Kurdsitnanê nebin xwediyê xakê, wê ti kirîz bi dawî nebe. Ji bo wê em wekî dostên kevin yê di nava pertiyê de wiha dibêjin, heta em Rêberê xwe di nav xwe de azad nebînin, em li qadan bin û ji bo azadiya Kurdistanê û pêkanîna doza Rêber xwe emê heta heta li ber xwe bidin. Lewra felsefeya Rêbertiyê kilîta çareserkirina hemû pirsgirêkên heyî ne.”



## Yan Berxwedan Belav Bibe yan Bêdengî Mezin Bibe

**Sînan Cûdî**

Perdeya heman lîstikê careke din li Sûriyeyê tê rakirin. Peymana entegrasyonê ya ku di 10’ê Adarê de bi Şamê re hatiye çêkirin, di nihêrîna pêşîn de xuya bû ku deriyê serdemeke nû vedike. Em bi hesreta aştiyê ya gelekî westiyayî û bi xwesteka derketina ji nav kavilên şer hêvîdar bûn. Lê di nav çend mehan de me hemûyan dît ku ruhê peymanê zirar dîtiye û hikûmeta Şamê hewl dide ku bi rêbazên xwe yên kevn, bi kirîna demê û bi derengxistina sozan, pêvajoyê têk bibe.

Hikûmeta navendî careke din dixwaze hemû rêveberiyê bi navendekê ve girêbide, mirovan pasîf bike, jinan di malên xwe de bigire û ziman û çandan wenda bike. Bi ferzkirina destûrekê li ser bingeha şerîetê, ew amadekariyê dike ku mafên jinan ên bi dest xistî, pergala hevserokatiyê, perwerdehiya pirzimanî û jiyana komunal têk bibe. Lê divê ew bizanin ku ev 14 salin me bi coşek demkî nejiyane. Me ev pergal di şevekê de ava nekir. Me ew bi xwîna şehîdan, bi xwêdana meclisên gel, bi berxwedana jinan, ji bo pêşeroja zarokên xwe ava kir. Niha, her îradeyek ku bixwaze wê bi hinceta “entegrasyonê” hilweşîne, dê ne tenê bi avahiyek siyasî, lê di heman demê de bi gel bi xwe re jî rû bi rû bimîne. Ji ber ku ev gel êdî ne tenê rêberên xwe, lê di heman demê de şêwaza jiyana xwe jî hildibijêre.

Niha, pirsek heye ku divê her kes ji xwe bipirse: Ev 14 sal ji bo me çi wateyê didin?

Ger jinên li taxên me di vê demê de karibûn bi azadî bigerin, ger zarokên me karibûn zimanê xwe yê dayikê fêr bibin, ger me karibû gundên xwe bi meclîsên gel birêve bibin, wê hingê ev destkeftî ne tenê “derfetên demkî” ne, lê îradeya gel bi xwe ne û ev îrade dê paşve gav neavêje.

Ji ber vê yekê divê çi were kirin?

Em nikarin vê pêvajoyê tenê li bendê bimînin, pêşveçûnan bişopînin û bi hêviya çareseriyek ji kesekî derbas bikin. Ji ber ku pirsgirêk sîstematîke, û çareserî di beşdariya rasterast a gel de ye.

Îro, divê meclisên gel li her kolanê, her taxê, her dibistanê, her zeviyê ji nû ve werin rêxistin kirin. Divê jin dîsa werin cem hev, ciwan dîsa berpirsiyariyê bigirin ser xwe û aboriya herêmî ji nû ve were vejandin.

Ji ber ku şoreş ne tenê li eniyên şer dest pê dike; ew li tenûrê, li kursiyên dibistanê, li sûk û bazaran mezin dibe û ev têkoşîn divê ne tenê li Rojava, lê li seranserê Sûriyeyê deng vede. Ger jinek li Heleb, Deraa, Siwêyda, Lazkiyeyê, Idlîb û Şamê dixwaze ji bo zarokên xwe pêşerojek azad ava bike; ger ciwanek bixwaze bêyî ku bêkar be bijî; ger Ereb, Kurd, Asûrî, Êzîdî bixwaze xwe wekhev hîs bike, ew şirîkên vê têkoşînê ne. Ji ber ku ev pergal edaletê ji kesî re nayne; ew tenê îtaetê dixwaze.

Tiştê ku divê em bikin ev e ku em bêdengiyê bişkînin. Ew mezinkirina beşdariyê li dijî navendîbûnê, azadiya jinan li dijî ferzkirina şerîetê û meclîs û komînan li dijî zilmê ye. Îro, parastina mafên ku hatine bidestxistin ne bes e; pêdivî ye ku ew li seranserê Sûriyeyê belav bibin. Ev şoreş dê ne tenê bi parastinê, lê bi mezinbûnê bijî.

Ji bîr mekin: Yan berxwedan belav dibe, yan bêdengî mezin dibe.



# Bi pêkanînên asîmîlasyonên bê sînor, xwestine qirkirina çandî temam bikin


**Ji ramanê Rêber Apo**

Çanda Kurd bi tevahî hêmanên xwe yên madî û manewî ji sedî sed hatiye înkarkirin û qedexekirin, bi pêkanînên asîmîlasyonê yên bê sînor, xwestine qirkirina çandî temam bikin.

Çanda Kurd tevahiya dîrokê di mezinkirina çanda çemê sereke de û di tesîrlêkirina wî de bi roleke pêşeng rabûye. Lê ji ber ku devera wê ya jiyanê timî li qada şer a dîrokê bû, ji bo hebûna xwe biparêze û bergiriya xwe bike, xwe vekişandiye serê çiyan. Bi saya çiyan, karîbûye bibe gelê herî kevin û bibe xwediyê vê nasnavê. Aliyê vê yê neyênî jî ew e, di nava xwe de zêde cih nedaye çanda bajêr. Bi bajêr re timî di pozîsyoneke dijber de maye û bajar weke cinawirekî wê daqurtîne û bixwe dîtiye. Lewma çanda qebîle û eşîrê ya ji rêûresmê heta roja me ya îro hebûna xwe parastiye. Forma qebîle û eşîrê şêwe û qalibê bingehîn ê çanda Kurd e. Çawa ku sosyolojî dide nasîn çanda eşîrê çandeke bi rêya baviktî û xizimtiyê nîne, çandeke jiyana azad û şêwazekî heyînê ye, bi berxwedana li dijî şaristaniyê xwe diyar dike, bawer dikim ku bi vî awayî danasîna wê duristir û rasttir e. Li cem Kurdan çanda eşîrê gelekî bi hêz û xurt e. Ji ber ku tevahiya dîroka şaristaniyê bûne xwedî îrade ku bi berxwedanê xwedî li hebûna xwe û jiyana azad derkevin. Di vê de têkiliya baviktî an jî xizimtiyê diyarker nîne. Rêûresma Zerdeştiyê di vê çarçoveyê de ji rêûresma dînê Semîtîk cudatir e; mirovan nake evd, bêhtir wan dikişîne aliyê jiyana azad. Di navbera wan de cudahiyeke evqasî bi kok û binyad heye. Di dema serdestiya Îslamê de rêûresma Zerdeştî derb xwar û bi vê re jî evdîtî hat. Desthilatdariya Îslamê bi dijwarî dijmintiya rêûresma Zerdeştî kir û di binê vê dijmintiyê de ev diyardeya evdkirinê û çînîkirineke hişk heye. Kurd çiqasî tevlî Îslama desthilatdariyê bûne ewqasî bûne evd, bûne kole û ev xusûseke gelekî girîng e. Di çanda Kurdan de îradeya ji bo jiyana azad bi hatina Îslama Desthilatdariyê re derbeke xedar xwariye. Li dijî vê, berxwedanên li ser bingehê Elewîtî û Êzîdîtiyê bi rêûresma Zerdeştiya kevin re têkildar in, û bi awayekî bingehîn a di vê de rol dilîze destnekişandina ji îradeya jiyana azad û çanda derfetê dide wê ye. Terîqet û mezhebên ji Îslama Desthilatdariyê reviyane û xwe jê dûr girtine, çiqasî bi nexweşiya desthilatdariyê neketine, bêhtir alîkariya jiyaneke azad û bi exlaq kirine. Ev bi awayekî rêxistinên xweparastinê yên serdema navîn in. Çanda Kurdan bi awayekî bingehîn di serdema navîn de bi van du riyan hem hebûna xwe parastiye, hem jî di jiyana xwe de cih nedaye evdîtiyeke bikeve hinavê wê û xwesteka xwe ya ji bo azadiyê bi dilsozî dewam kiriye.

Çanda kurd di bin zordariyê de hiştin

Modernîteya kapîtalîst, çawa ku di qada çanda maddî de kiriye, di qada çanda manewî de jî helwesteke asîmîlasyonîst û qirker nîşan daye û ev jî bi mekanîzmayên tinekirinê yên dewleta netewe pêk aniye. Dewletên netewe yên Ereb, Tirk û Îranê ku bi awayekî acente û saziyên sîxur ên modernîteya kapîtalîst in, ji avahiyên desthilatdariyê yên rêûresmê sûd wergirtine û





çanda Kurdan bi temamî kirine mengeneyê, ji tevahiya derfet û îmkanên perwerdeya bi zimanê dayikê mehrûm kirine, pergala perwerdeyê ya medreseyên rêûresmê xira kirine qedexe kirine, çand û zimanê Kurdî di nava saziyên çand û zimanê serdest ên dewletên netewe de ji îmhayê re terikandine. Hinek hewldanên lawaz û zelûl ên milletperestiya Kurd ji bo parastina çanda Kurd (xebatên wêje û ziman) bi ser neketin û tevî vê jî li hemberî hevrikên wan ên bi hêz rê li ber reaksiyoneke dijber vekiriye. Eger çanda berxwedanê ne bi hêz be, çawa di her diyardeya bi vî rengî de tê dîtin, bivênevê her ku diçe dihele û tine dibe. Herweha bi awayekî giştî formên milletperest ên bûrjûwayê di wê kapasîteyê de nînin ku çandên gel zindî bihêlin û pêşde bibin, berevajî xwedî fonksiyonekê ne ku wan çeloxwarî dikin û naveroka wan pûç dikin. Di modernîteyê de çanda nivîskî li asta herî jor e, lê bi sedema qedexekirin û asîmîlasyonê, ji bilî çend xebatên lawaz û qels çanda Kurd pirr kêm berhem dane. Di van berheman de jiyana azad negihiştiye îfadeyeke rast, bêhtir di van berheman de arîstokrasiya eşîrê, pergala wan a begtiyê û otorîteyên dînî derketine pêş.

Di rastiya Kurd de ji bo pêşketina çanda neteweyî rola modernîteya kapîtalîst neyênî ye. Di warê pêkanîna çanda neteweyî ya bûrjûwayê de nêzî rastiyê jî nebûye. Çanda dimeşe û tê pêkanîn, çanda îmhaker, asîmîleker û qirker a dewleta netewe ya serdest e. Sloganên faşîst ên weke ‘tek welat’, ‘tek netewe’, ‘tek ziman’, ‘tek dewlet’ û ‘tek al’ ku her roj têne dubarekirin vê rastiyê îfade dikin. Hêmanên modernîteya kapîtalîst ên ji asîmîlasyon û çanda zordest a serdema destpêkê û navîn bi gelekî wêdetir xwedî sîstemekê ye, weke sê suwarên mehşerê, demekê beriya demekê li pey pêkanîna mehşerê ye. Çanda dewleta netewe, îndustriyalîzm û kara herî zêde ji bo ku çanda Kurdan a rêûresmê ya hê ji modernbûnê dûr e, û hê nebûye neteweyî biqedîne, bêperwa tevahiya rêbazên îmhaker bi kar tîne.

Çîroka pêkhatina bûrjûwaziya Tirkê Spî ya kapîtalîzma burokratîk a Tirk ew afirand, bi temamî komploker e. Komplokeriyê ji serî ve çanda împaratoriyê ya ji rêûresmê ji xwe re kiriye pêpelûk û maske, bi awayekî navenda wê derve û hundir be civak rehîn girtiye. Di vê çandê de civak êsîr e. Elîteke çînî ya welê çêbûye ku çanda civakî ya ji xwe re orîjîn dihesibîne jî (etnîsîteya Tirk û Îslama Sunnî) rehîn girtiye, û eşkere ye ku ev elît wê li ser rastiya çandî ya Kurd bi roleke texrîbkartir rabe. Tevahiya sedsala 20. bi mînakên bi vî rengî yên balkêş tijî ye. Çanda Îttîhad û Teraqî ya îdeaya wê ya gavavêtinê li ser bingehê laîk hebû û nexasim bi CHP’ê şêweyên wê yên bêhtir bûne desthilatdar, piştî ku tesfiyekirina hebûna çandî ya Ermenî, Helen û Suryanî temam kirin bi tevahiya hêza xwe berê xwe dane tesfiyekirina çanda Kurd. Hem di dema 1925-1940’î pêvajoya isyanên provokekirî de, hem jî paşê di bêdengiya mirina spî de rêbazên tineker heta dawiyê bi kar anîn. Tevî ku carinan qirkirinên fizîkî pêk anîn jî bi awayekî bingehîn a pêk anîn modela qirkirina çandî bû.

FENER



## Geşbînî Bi Qasî Helwest Û Seknê Ye

**Idrîs Henan**

Keştiya geşedanên siyasî yên bi lez di nav pêlên deryayên Rohilata Navîn û çiravên sermayedariya global de diçe û tê. Geh dinoqe û bi bin avê dikeve û geh jî bi ser pêlan dikeve û rêwîtiya ber bi azweriyan ve dewam dike. Lê qerebalixa zêde ya li herêmê bi daholên şerê cîhanê yê sêyemîn re bilindtir bûye, serweriya xwe li ser dengên azadîxwaz û demokrasîhez ferz kiriye ku hewl dide di heyameke wisan de bifetisîne û di bin avê de bihêle.

Beramberî wê jî, gelê herî qedîm ê li herêmê ku bi hevkarên bê xêr re rûbirû maye, rastî êriş û hewlên îxanetê hatiye. Çiravên sermayedar piştgiriyê didin cokên serdestên Rojhilata Navîn û dagirkeriya wan ji axa gelê qedîm re mayînde dikin. Xwestekên wî yên xwebirêvebirina rewa paşguh dikin û ne jî li gorî berjewendiya xwe dibînin. Cirecir tiştek e û pratîk jî tiştekî din e. Çendîn pesna dostanî û wefedariya wan were kirin jî, lê hêjayî azadiyeke bi rûmet nabînin û ne jî azadiyeke derveyî sînorên kelehên wan hatibe vesazkirin dipejirînin. Bê guman em qala Kurdan û pêşengiya wan ji vê qonaxa çarenûsî re dikin. Ango; Kurdên dixwazin bi îradeya xwe ya aza re tezên pêşeroja xwe xêz bikin. Kurdên ku bi têkoşîneke zor û zehmet hebûna xwe anîne vê roja me ya îro. Kurdên ku bi hezaran pakrewan pêşkêşî doza azadiya gelan û pêşengiya feraseta pêkvejiyanê kirine.

Diyar e vîna li ser bingeha tunebûna gelan hatiye avakirin, hewl dide xwe tekûz bike û di nav heyamekî bê exlaqiyê de azweriyên xwe biçêrîne û li ser stûyê gelan weke narvîn bisepîne. Ev pêvajo bi salan e wisa hatiye, serwerî û kirêtiya xwe jî bi vî rengî rewa kirine. Siyaseta îro bi pêşengiya bazirgan û şamanên destpot ên zîgoratên serdema nûjen û perestgehên sermayedar, şerên qirêj ên serweriya li ser jêderên xêr û bereketê bi rê ve dibin. Miraza wan, bê ku îradeya gelan berçav were girtin, vehûnandina stratejiya sedsaleke nû ye. Lê pirsa bingehîn ew e; gelo dikarin di rewşeke wisa kirîtîk de, bêyî Kurdan stratejiyên nû ava bikin? Rûmetgirtina ji daxwazên Kurdan û gelên qedîm re, wê çi bi wan bide qezenckirin û çi jî bi wan bide ziyankirin? Gelo ziyan an qezenc zêde ye? Berjewendî û stratejiya hêzên hegemoniyê, li gorî plan û bazarên qezenc û zirarê tên tayînkirin. Yanê ne li gorî berjewendiya gelan e! Lew re jî; divê rêjeya geşbîniyê jî bi qasî amadekarî, helwest û seknê be, ne li gorî nakokiyên berjewendiyên aliyên rikberê desthilatdariyê be. Dibe jî li gelek dever û mekanan hev û din êşandibin, lê ev nayê wê manê ku ji bona me ev tişt hatiye kirin. Fikirandinek wisa xwexapandina piştî nîvro ye. Piştî ku rejîma Îranê anîn asteke wisa rezîlane û bê hêl hiştin, demildest bomebarana xwe rawestandin û agirbest ragihandin. Vîna gelan di ber çavan re derbas nekirin. Dêmekî doza azadiya gelan bi pevçûnên berjewendîperest, desthilatdarîperest re nayê çareserkirin. Berovajî; doz bi daneheva têkoşîneke bi rûmet, ked û fedekariyeke mezin a bê hempa digihêje azadiyê. Siyaseta wan çi dibe bila bibe, ya girîng Kurd bi vîneke serbixwe bibin xwedî siyaseta demokratîk a çareserker ku bi doza xwe re hemû dozên gelên dîtir çareser bikin.